# DENGÊ KURD

10-Sermawez-2713 k 1-12-2013 z DENGê KURD -hijmar (21) www. Pdksp.com


# Li Amedê kurdayetî Bi Barzanî bişkivî



## Serkeftin

Kar û xebata siyasî gelek wêstgeh û çevanekên dîrokî jê re hene ji ber ko koşiş û têkoşîn pêwîstî qonax û heyamên rêrazkirîne û di nav ra dibe ko mirovê siyasetvan bi serkeve yan li bin keve ji ber ko ew di zeftûmesta kawdan û rewşa navxweyî û navherêmî û navnetewî de ye .Serdana rêber BARZANî bi bal Bakûrê Kurdistanê ve û nexasma Amda Peytext serkeftinek netewî-dîrokî bû di hevkêşana hemû pîvan û mînaknde çi li astê ladana hêlên sor û çi li astê rêxwşkirna danûstana di navbera kurd û Tirk de li ser qada hingûfî û hempabûneke yaksanî û serdest de.

Dengê kurd


L2 Kargêrana demikî mafê netewî binpê dike

L3 Kongir û dîdarên toremenî li navtaxa rewşenbîrî ya kurdî seqetin

L3 Neviya Bedirxaniyên Mesrê " Jibîra nakim ez kurd im

# Li Amedê kurdayetî bi Barzanî bişkivî



Perîzad Kîkanî

Dîrok tête guherîn bi destê mêrxas û lehengan ew kesên ku dişên di çivanek û wêstgehên girîng û hestyar de pêngavên serdest û serbest bi havêjin bê dudilî û gomankêşan ,ev bûyer hate terxandin di serdana rêber mesûd Barzanî de dema ku berê xwe da amedê li ser vexwendineke fermî ji bal serok wezîrên turkiyayê ve da ku guftûgoyan bikin liser pirisgirêka kurd û pêvajoya aşitiyê ya ku di navbera desthilata turkiyayê û ( pkk )de hatiye bestin û birêve çûye li newroza 2013 da ku çareseriyeke sazankirî û haşikirî bibînin û li darxînn bi hevra. *nakokiyên ku peydabûne di navbera herdû aliyan de wekû kurd û turk ji mêj ve û ta rûxan û hilweşandina dewleta osmanî û li dûv re bi bestina rêkeftina(saykis-bîko)û bi şûn de zor û belavin û ne tiştekî hêsane ku bête çareserkirin,bo wisa hoşmendû bîrawerên şareza şayestî pirsgirêk û kêşedozeke wilo ne da ku têkeve rêge û rêbaza çare û çareseriya rasteqîne bê hilêbû berjewendiyên kesokî û aligirî çi li astê civakî û çi li astê siyasî. -kesayetiyeke wekû mesûd Barzanî xwedan karîzma û pesn û salixên dilkeş û xwedan serbuhêrk û ezmûneke dûr û dirêje ji xebat û têkoşîna rizgarîxwaz çi di warê şoreşgêrî de û çi di warê siyasî û dublumasî de û bi destxistina hemû derînkû berînkan û vehûnana hemû rist û rêsan û tevnên siyasetên biragmatî di xizmet û koşişa kêşadoza neteweya kurd de û çespandina kurdayetiyê li sertaserî turkiya û devera navherêmî liser sê rehendên serekî, yekem: nasandin û pêşxistina kêşedoza kurd bi her kesekî nahez û neyar li rexê turkî û navherêmî û navnetawî. û nehêlana mandellîbûnê ji kurd û neteweya kurd re di nava serdem û heyamên dîroka dûr û dirêj de li nax û kurahiya hemû bûyer û qewmanan de. Duwen: pişkûrîn û vekirina hemû dergeh û pencerên siyaseta biragmatî li ber kêşedoza kurd bi layenê turk re da ko pênasîn û têkeliyên duqolî encamên xwey balkêş û hêvîxwaz bidin Sêyem: girinîgpêdana navnetewî bi kêşedoza kurd ve da ko ew girinîgpêdan cihê lêpirsîn û karîgeriyê be liser alîgirê turk jibona pêvajoya çareserkirinê da ko herdû alîgir bi hevra û yekdî têkevin hevkêşana çareseriyê û encamdana duqolî û wisa biserxistina siyaseta biragmatî -Mesûd Barzanî di serdanê de kilîta çareseriyê ye û di pevajoyê de alavê ladana astengî û kospan e û di serxistinê de pîroziya mafkeşan û encamên rewadare têkravêkra û peyayê kajmêra serdemê çareseriyê û serkefyinê ye.

# Kargêrana demikî mafê netewî binpê dike

Laleş Waşokanî

Her çendakî ( pyd )ê daxuyanî û duruşmên siyasî aşkira dike sebaret bi Rojavayê kurdistanê ve , wekû serdr û rêberekî serdest û mafdar , wa diyare ko herdem ( pyd )ê xwe daye pêşandan ko ew serdest û serdare di Rojavayê Kurdistanê de û ko ew bi tena xwe ew parçe ji Kurdistanê rizgarkiriye û ew xwedî mafe ko desthelatê li darxînê û birêve bibe û bi vî awayî û bi vê sewdangeriyêtevgera rizgarîxwaz daye alî dibin darê zorê de bi palpştiya rijêmê. Kargêrana demikî afrandineke ji afrandinên ( pyd)ê ye dema ko di keve warê dûrêzkirina zaravsaziyan û sepandina wan li ser miletê Kurd bi şêweyekî fermandarî wek desthelatek fermî bêdanûsitan li rexsandina derfetan û yeksaniya pişk û paran ji hemû layen û part û alîgirên siyasî û civakî û rewşenbîrî ve bê ciyawazî , ev kargêrana ko tête li ser axaftin ew tevlehviyek navxweyî ye û pîlangêriyek rijêmkariye hatiya ristin û hûnan ji bal damûdezgehên ewlekariya rijêma Esed ve da ko Kurd û tevgera Rizgraîxwaz rasterastî hev werin û nakokî bêhtir û kûrtir bibin di pirisgirêka qeyrana ko lidar û pevxistî. Ev kargêran bi rastî ji beriya salekê û bihtir ve li dare li devera Kurdnişîn û nexasma dema ko rijêmê kargêrana xwe vekişand ji çend Bajar û bajarokên Kurdî û kargêran radestî ( pyd)ê û darûdestên wî kirin da ko sê armancên serekî bi cihbîne,yekem:lêdaneke kûr û binbirkirî li kşêdoza Kurd û tevlihev kirina kaxetên pêşkariyan ji bal Tevgera rizgarîxwaz ve da ko tevger hew dikaribe karname û bername yê xwey siyasî berdewam bike û bi bie serî û sersedê û vegere xala destpêkê û xêzverka pevbendîyê ji nûve de .
Duwem: şêwandin û rengperandina kar û xebata siyasî li gel tevgerê û nifşên nûhatî da ko bêhêviyê peydabike di mejî û sewdan û dilê gencên Kurd de û wisa hest ûhizir têkbiçin ji warê kurdewariyê. Sêyem: berpakirin û vêxistina şerûpevçûnan di navbera aligirên dijber de di tevgera Kurdî de da ko Kurd kêşedoza serekî ji bîra bikin û nakokî bêhtir bibin çi li astê xwînrijtinê de û çi li astê kûrkirina kelênên nakokiyên siyasî û civakî û abûrî De . Bê şivîsk û goman kargêrana demikî ya ko ( pyd ) ê li ser kab û manaşa xwe durust û ser rast dike pîlangêriyeke metirsîdar û çivanek dêre di pêvajoya kêşedoza Kurd de li Rojavayê Kurdistanê.



www.arsivakurdi.org

# Kongir û dîdarên toremenî li navtaxa rewşenbîrî ya kurdî seqetin

şêrzad osman



Her çendakî qûryan çêdibin ji hindek alîgir û layengirên siyasî ji bo li darxistina kongir û dîdarên toremenî çi helbestî û çi li astê danûsitanên kargêrana têkelî û peywendiyên navtaxî di navbera helbestvan û torevanan de -Berî heyamekî ne dûr çend kongir û dîdar lidarketin li başûr û rojavayê kurdistanê li jêr duruşmê yekîtiya nivîskarû helbestvanan lê ew duruşm û rewşa kongir û dîdarên ko hatin gêran û pevxistin li hev ne digunciyan ji ber ku vexwendin û banghêştkirin alîgirxwazî û dilxwstin tê de aşkira bû, gelek kesên vexwendî û amadebûyî ne xwedan pênûs û behereya toremeniyê bûn, dêmekî ewan kongir û dîdaran sexerbûn û têkçûn bi dest ve anîn paşî velîstina şêwandin û nakokiyên takekesî û navherêmî û bellûbûna kêmasî û kêmûkuriyên astên toremenî ji ber lawazbûn û sakarbûna paşhat û paşxana rewşenbîrî li bal gelek amadebûyan. -Toremeniya kurdî bi hersê kuçên xwey serekî di qeyrana ezperestiyê û minêkariyê de dijîtin jiber ko qata kargêr ne di astê berpirisyariyê de ye û ne di xemxoriya pêşvexistina toremeniyê de ye ji ber ku tu karname û nexşedanîn li bal nînin da ku karibe pêşbînî û geşbîniyên aso vekirî li darxîne.-li astê paşhatê rewşenbîrî û hest û ramanê kurdewarî ew qata toremenî di qeyrana lawazî û sakariyê de dijî û digere û nikare xwe pêşbixîne û wisa amadekarî û amadebaşî û biryarên wê çewt û şaş têtin sitendin û encamin berovaj derdikevin li kotasiyê . -û li astê têkilî û peywendiyên alîgirî û dubendîtî xwe disepîne ser panava sewdanê rewşenbîrî, dêmekî nerîn û tênerînên tesk û teng têne berçavkirin li asoyeke mijdar û bergirtî û wisa rewşenbîrî tariyê liser xwe vedigre. û li astê têkelî û peywendiyên navherêmî hêl û kospên dîrokî û siyasî zor û belavin ew qata kargêr nikare wan bide alî jiber nebûna karîzmaya rewşenbîrî û vegirtina ezpereştiya nazxwazî û dildariya dilînî di rewangehê çespandina gotar û hevpeyvînên toremeniyê de -li dûmahîkê navtaxa toremenî û rewşenbîriya kurd wekû navtaxa siyasî ne li astê bûyer û pêşbîniyên kurdewariyê ye .

## Neviya Bedirxaniyên Mesrê

# " Jibîra nakim ez kurd im, û karê peymangeha Bedirxan pîroz e"



Hozan Dêrşewî

Hêviya min ew e ku ez fêrî zimanê kurdî bibim, bihtirî sed salan e ku em li welatê Mesrê dijîn, resenê me kurd e ji Cizîra Botan in, Jibîr nakim ez kurd im, pêwîst e her mirovek xwedî derkeve li zimanê xwe, û nasnameya xwe, û dîroka xwe bixwîne ji ber xwe nas bike û xwe bide naskirin di nav miletan de, karê peymangeha Bedirxan pîroz e, ez hêvîdar im ku şaxê peymangehê li hem û kurdistanê vebin ji ber ku ji me re girîng e" Bedirxaniya Mesrê di hevdîtinekê de bi peymangeha Bedirxan(a Zimanê kurdî li Dêrikê) re weha axivî , Nansî Ismaîl walî Elî Bedirxan, neviya Bedirxaniyan , hestên bixemgînî diyar dike ji ber d ûrb ûn û sergoniya wan ji Kurdistan û çand û nasnameya wê, dibêje "Bedirxaniyên Mesrê li Qahîra û Alfiyom dimînin, mala me her dixemilî bi kurdên ku dihatin Mesrê weku xwendevan, dîplomasî û penaberan , bavê min bi hem û karînên xwe alîkariya wan dikir ". Xanim Nansî derç ûya beşê ragihandinê ye li zankoya Emerîkî li Mesrê, her weha derç ûya beşê dîroka hunerê ye li zankoya Sorbonê, û bi zimanên Erebî, Inglîzî, Ferensî û Ispanî diaxive , her weha n ûnertiya jina Mesrî kir di konferansa jinê ya rojhilata navîn li Amedê di gulana 2013 an de, endama komeleya mafên jinê ya mesrî ye, niha di kompaniyeke geşt ûgozariyê de kar dike li Mesrê. Xanim Nansî bi hevjîn e, û du zarokên wê hene (Şerif û Ranî).



Behcet Hemo

# Çima

Bextê xwe hişiyar bikin,bêdengiyê bikujin û van pirsan ji xwe bikin: Çima tenê li ser çarçûveya pencerên me ji dêla ku şalûl û bilbil,çûk û reşêl li ser bilîsin,tenê pîrepind konên xwe bi giranî li ser dirêsin?.
Çima tenê zarokên me ne xweşik dixwin,nexweş dirazin,nema dikenin,ne jî dilîzin?.Çima şahiyên me derbas dibin weke ewrekî giran û bê baran ?. Çima kaniyên evîniyê,biratiyê û wekheviyê dimiçiqin,û xewnên pirpirîkên kezebên me dibin piyê hovîtiyê de diperçiqin?. Çima vexwendina vexwarina qehweya serê sibê li ber dergehê cîranan bê war maye?. Çima dergehê cejna Qurbanê û Remezanê ji bo du kîlo şekir li ber kêfa zarokên me girtî û sêwî maye?. Çima nanê tenûrê bê bîn maye...!dengê bilûrê bê tîn maye…!?. Çima şûna rengê şîn û şahiyê tenê dilê bi şewat û şînî maye…çima…!?.

www.arsivakurd.org

# Pakrewanek Ji Gundê Min

**Barzan husên**

Tu niha di dilê minde wekî tîrekî derbas dibî
Ez te dihimbêza xweda dilorînim
û xewna te ji herçar aliyên van welatan re dibêjim
Dijminê te ji goristana nasdikim
Ez te di bîra xwe da wek pakrewanekî diteqînim
Di xewna xwe da wek hawîrekî di bînim
De wer pakrewanê min
Were ezê serê xwe danim li ser çoka te
û çîrokên te ji berfêre bêjim
Ji golên sor yên xwînê re bêjim
Destê xwe bide min û ji birîna min şerm neke
Dilê xwe bide min û ji evîna min şerm neke
Bi çavên xwe wek deryayê li min binêre
û ji mirina min şerm neke gundê min
û kesera bavê û dergûşa ji kevirî bihejîne
û dena çendî sala nûka û ava zelal li mêvana bi gerîne
De bêje gundê min de bêje çendî caran Bavê Ela
Di kolan û kanî û dehlên te de di civî
Çendî cara di xewna şîrîn da ji dengê wî tu di hilçenî
Adara te di vedgerê gundê min
Ez jî dinavên te de dibişkivim
Di bîranîna te da disojim
û bi te momên sîngê te vedixwînim
Pakrewanên navê te di xewna pîroz da himbêz dikim
û şoreşgêrên te li ber destê azadiyê rêzdikim
Te bi xwera dibim
Te bi xwera tînim
û em bi hevre di cejna hebûna te de dimînim
Em bi hevre rêçbûna azadiya te dibînim
Em bi hevre êşê ji dilê dayka radikin
û bi hev re berbanga çavên te himbêz dikim,,,, gundê mino,,, gundo

# pêşmerge

**Helbest: Elî kano - hesekê**



Hatin pêşmerge hatin
Bo jiyanek azadî
Bi canê xwe fidabûn
Azadiya wa dixwazin
Ew hêvî û daxwazin
Ala partiyê rakin
Wêneyê Berzanî rakin
Tu pilingê kurdistane
Canên me ji tere fidane
Pêşmerge ronî da riya
Barzanî şêrê li ser çiya
Pêşmerge dibê mê tevde rabin
Ji bo kurdê Barzanî

Xwediyê soz û xebatin
Bûn leşkerê Barzanî
Paristina kurda dikin
Bijî pêşmergê Berzanî
Xortino rabin xwe karkin
Xortino rabin xwe karkin
Navê te Berzane
Helbesta ser zimane
Bijî neviyên Partiya
Mes'ûd şêrê kurdistanê
Heger dijmin nêzîkî kurda dibe
Mê bi canê xwe fidabin
Ji bo malbata Barzanî

# Welatê Çirto û Virto

**(tenazî)**

**Can bapîr**

dibêjin: ramiyariya kurdan di şêl û bêlekê de dijî, yan jî girara rijî û nanê ne pijî, hinek ji encumana rojava nanê ser sêlê ne, çep û rast ê wan nas nabe..! yan wek Birekê, li çûnê dixun û li hatinê dixun, ma te bihîst bac dane ser (zeytê)û dukanan ?! tiştek nema ku bacê bidin ser bêhna me jî !! ê xem nake,, me bihna xwe ji welatê Çirto Virto wergirtiye, lê bêhinvedan jî bi peran e !! Çirto rist û Virto bada .. û tir li xarê ling li ber rada, me teşîrês dibin loo, me nanpêj dibin loo
welatê Çirto û Virto ne nan dipêjin û şîr ji pêsîra milet dimijin 100
silav ji boy giyanê te Çirto û werqas ji boy te Virto.



**Bavê Serbest-hesekê**



# Dengê kurd

Dengê kurda vaye hat
Bi sîstem û kêferat
Ala pîroz û rengîn
Divêt ji me ev xebat
Aza dibe roj ava
Na tirsim xefk û dava
Werin em tev bibin yek
Li ser seran ser çava
Diparêze foloklor
Tore, dîrok, kelepor
Tîrêj seranser didin
Li kurdistan jêr û jor
Tevde pend û bi şîret
Doza wiye serxwebûn
Daxwaza wê pêşveçûn

Heçî kurdên xwedî doz
Bi aştî bi amoz
Divê hilbe dagirker
Li ser bibe terpetoz
Bang li kesên nivîskar
pertûkxane maye sar
Werin em lê bibin kom
Bi hev re rahêlin bar
Hêvya min e nivîskar
xweşxwan û rist û gotar
Bi qefla jêre rêkin
Tîr bêne çavê neyar
Bavê serbest tim hebûn
Welat perwer bi taybet
Armanc yekbûna milet

www.arsivakurd.org